Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1015 | 20-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# ‘Zimanê karîkaturê alîgirê jinan e!’

**Karîkaturîst Aisha Madhous bal kişand ser kêmbûna hejmara karîkaturîstên jin ên li Mexrîbê û got ku jin bêyî ku di bin zexta pîvanên civakî de bin, dikarin xwe bi awayekî azad îfade bikin û dikarin di vî warî de hebûna xwe nîşan bidin.**



Beşa ewil a pêşangeha Rojên Karîkatûrên Jinê ku li bajarê Kazablanka ya Mexrîbê di navbera 15’ê Cotmehê û 15’ê Mijdarê da hat lidarxistin bi dawî bû. Çalakî ji bo balkişandina li ser wekheviya zayendî ya bi sernavê “Wardiya we ya li El Shaqa” ku tê wateya “rola we di karê malê de” hat lidarxistin. Her wiha armanca çalakiyê pêşxistina şarezayên xwendekarên jin ên di warê hunera karîkaturê de bû. Karîkaturîst Aisha Madhous ku beşdarî çalakiyan bû ji ajansa me re axivî.

Aisha Madhous qala destpêkirina xwe ya hûnera karîkaturê kir û wiha got; “Ji zarokatiya xwe ve bi giştî bi xêzkirinê re eleqedar bûm û min dixwest bi xwendinê qabiliyeta xwe pêş bixim. Dema ku min ragihandina qursê di warê karîkaturê de dît, min xwest ez xeyalên xwe pêk bînim. Her çiqas şert û merc zor li min kirin jî min xeyalên xwe pêk anî.”

**‘Mijarên ez jê bawer bûm, bi awayê pêkenokan min karîkaturîze kir’**

Aisha Madhous da zanîn ku wê di qonaxên ewil de zêde der barê karîkaturan de nizanibû û wiha pêl da gotinên xwe, “Min ji bilî navê karîkaturê tiştek nizanibû û piştre ez beşdarî rêze lêkolînan bûm ku hişt mijarên ez jê bawer im bi tinazî vebêjim. Di nav de xurtkirina hebûna jinê û şikandina desthilatdariya baviksalarî. Li cihekî weke Mexrîbê tenê wênesazeke jin heye. Armanca vekirina pêşangehê îro ji bo jinan derfetek e. Divê jin beşdarî vê pêşangehê bibin û hêza xwe ya bi vî hunerî îspat bikin.”

**‘Karîkatur peyameke gerdûnî ye’**

Aisha Madhous a qala sedemên eleqedarbûna xwe ya vê hûnerê kir, wiha got: “Karîkatur amûrek e ku bi xêzkirina li ser mijarên cihêreng ramanan îfade dike; ew peyamek gerdûnî ye ku ji hêla herkesî, xwende û nexwendî, pîr û ciwan ve dikare were xwendin. Ji ber ku peyam bi xêzkirinê tê ragihandin, hemî mirovên ku bi zimanên cûda diaxivin bi gelemperî dikarin peyamê fam bikin. Di civakên baviksalarî de ji mêran re zêdetir cih tê dayîn ku xwe îfade bikin. Ger jin di vê mijarê de bi wêrekî nêrînên xwe bînin ziman ji aliyê civakê ve rastî êrîşan tên. Belkî jî ev e ku jinan ji vê qadê dûr dixe. Li gel ku hin mijarên ku em normal dibînin divê bi tinazan bên nîqaşkirin, lê civak jî wek tabû dibîne û tercîh dike ku nekeve nava wê.”

**Tiştên ku jin nikarin bibêjin, bi xêzkirinên xwe bilêv dike**

Aisha Madhous anî ziman ku ew bi xêzkirina xwe dengan dide jinan û wiha got; “Dema ku ez bi pirsgirêka jinê re mijûl dibim, ez hewl didim ku li kêleka wê bim û tiştê ku ew nikare bêje bêjim, ji ber ku tenê jineke weke wê dikare wê fêm bike. Jin hene ku ji mêran jêhatîtir in û ev jin ji ber hin zextên civakî nikare hestên xwe bîne ziman. Ji bo guhertina feraseta cudakariya zayendî û newekheviyê ez li ser van mijaran disekinim.”

**‘Divê jin netirsin’**

Di dawiya axaftina xwe de Aisha Madhous wiha got: “Jin baweriya xwe çawa dixwazin bînin ziman, netirsin, bêhêvî nebin û hewl bidin xwe bi pêş bixin.” ***JİNHA***

# Pêkhateyên Xurmatû ji bo aştî û biratiyê daxwazek ji aliyê siyasî dikin

**Li navçeya Xurmatû li gel Kurdan, Ereb û Tirkmen jî dijîn. Hersê netewe dixwazin di navbera wan de aştî, biratî û jiyana bi hev re hebe. Lê sedema pirsgirêkan aliyên siyasî dibînin û gotin: “Eger her alî ji bo berjewendiyên xwe kar bikin, di encamê de emê hemû zererê bibînin.”**





Xurmatû navçeyek Kurdane û di serdema rejîma Baas de, ji aliyê Sedem Hisêm ve di çarçoveya erebkirinê de, ji Kerkûkê hate qûtkirin û girêdayî parêzgeha Selahedînê kirin. Hejmare şêniyên wê 130 hezar kes in. Piraniya wan Kurd in. Li gel Kurdan Ereb û Tirkmen hene. Meshebê sunne û şîe ne. Pêkhateyên Xurmatû dixwazin bi hev re jiyan bikin, lê ji ber siyaseta şaş û pirsgirêkên neteweyî di nava van salên dawî de gelek pirsgirêk û alozî derketine. Di encama êrişa Heşdî Şebî ya di 16’ê Cotmeha 2017’an a li ser navçeyê de, tevahiya Kurdan koçî Kifrî û Kelarê bûn. Bi sedan mal û dikanên wan hatin teqandin û şewitandin. Niha peywendiyên di navbera pêkhateyan de berbi başbûnê diçe. Li ser mijarê kesayetên pêkhateyan ji Rojnews’ê re axivîn.

Rojnamegerê Kurd ê ji Xurmatû Şêwan Ebdulkerîm li ser jiyana bihevre ya neteweyên li Xurmatû got: “Navçeya Xurmatû ji sê pêkhateyan pêk tê û 2 mesheban. Ji destpêkê ve van hersê neteweyan pirsgirêk hebûn. Lê, di salên dawî de sal bi sal aloztir bû. Sedem jî siyasî bû. Lê mixabin di van salên dawî de gelek aloztir bû. Gelek kes bûn qurbanî û peywendiyên civakî yên di nava neteweyan de qût bûn.”

Şêwan Ebdulkerîm diyar kir ku niha hêzî hêzî peywendî asayî dibin, rewşa guncave û rewş berbi arambûnê diçe û got, “Lê, pêwîstî bi dem, lêborîn û xwebexşkirina zêdetir heye. Hîn hin kes mane ku hewl didin şaşiyên hene çareser bikin û li pêşiya şaşiya van hizb û aliyan bibin asteng. Ji bo ku bikarin yekgirtinê qebûl bikin û bermayiyên ji siyaseta şaş mane, tine bikin û li şûna wê peywendiyek xweşiktir ava bikin.”

Nivîskar û Rewşenbîrê yê ji pêkhateya Tirkmen Ebas Xelîl ji Rojnews’ê re axivî û got: “Ev çend sal in rewşa Xurmatû asayî ye û bêpirsgirêke. Bila çavê hemû aliyên siyasî û berpirs li milet be û baş temaşeyî vî bajarî bikin. Piştî wê hemû karasatê niiha di jiyanek baş dene. Xelk şiyar bûne û aştî û aramiyê dixwazin. Divê bajarê me pêş bikeve. Hemû netewe bi hev re bijîn. Divê weke şênî temaşeyî berjewendiyên xwe bikin. Bi aştî bijîn, ne ji bo qurbanî û nava gorê. Ger her aliyek ji bo berjewendiyên xwe kar bikin, wê di encamê de em hemû zererê bibînin. Ew hemû qurbaniyên rû dan ji bo çi bû? Kî li hember berpirse?”

Nivîskar û Rewşenbîrê yê ji pêkhateya Tirkmen Ebas Xelîl daxwaz ji berpirsên Xurmatû kir ku bihêlin milek bi aştî û aramî bijîn û got: “Bi giştî dibêjin milet hemû yeke. Bila êdî berpirsan şer û pirsgirêkan çênekin. Bila tenê di pêşerojê de ew bûyer dubare nebin.” ***- ROJNEWS***

Sudoku:Pirs 25

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | 7 | | 5 | | | | |
| | | 9 | 8 | | | 5 | | 2 |
| 4 | | | | 3 | | | 8 | 7 |
| | | 5 | | | 8 | | | 4 |
| | | | 3 | | 7 | | | |
| 1 | | | 5 | | | 8 | | |
| 6 | 8 | | | 2 | | | | 3 |
| 7 | | 1 | | | 3 | 6 | | |
| | | | | 9 | | 1 | 4 | |

Sudoku: Bersiv24

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | 3 | 1 | 9 | 6 | 5 | 7 | 2 |
| 5 | 2 | 6 | 4 | 3 | 7 | 8 | 9 | 1 |
| 1 | 9 | 7 | 8 | 2 | 5 | 4 | 3 | 6 |
| 7 | 5 | 4 | 6 | 1 | 2 | 3 | 8 | 9 |
| 3 | 6 | 9 | 5 | 8 | 4 | 1 | 2 | 7 |
| 2 | 1 | 8 | 9 | 7 | 3 | 6 | 4 | 5 |
| 9 | 4 | 1 | 2 | 5 | 8 | 7 | 6 | 3 |
| 8 | 7 | 5 | 3 | 6 | 9 | 2 | 1 | 4 |
| 6 | 3 | 2 | 7 | 4 | 1 | 9 | 5 | 8 |

# Kovara Temaşe cara 7’an derçû

**Kovara bi navê “Temaşe” a sînemayê ku dijîtal tê weşandin, bi hejmara xwe ya 7’an careke din derket pêşberî sînemahezan. Kovara “Temaşe” jî berga vê hejmara xwe weke gelek kovarên Kurdî vê mehê derçûn, cih daye Jîna Amînî.**




Kovara “Temaşe” ji sê mehan carekê çap dibe û di kovarê de nivîsên bi Kurmancî, Kirmanckî û Soranî cih digirin. Di vê hejmarê de jî 12 nivîsên Kurmancî, 3 nivîsên Kirmanckî û nîvîsek jî bi şêwezarê Soranî heye.

Di beşa Kirmanckî de Pinar Yildiz bi serenavê “Sînoran Ser ra Ver bi Keyeyî: Sînemaya Alî Kemal Çinarî” behsa sînemaya Alî Kemal Çinar kiriye. Her wiha Welat Ramînazadiyî jî bi mijarek cuda bi serenavê “Filmê Beatsî: Şiknayîşê Ezîktî û Ferdbîyayîş” li pêşberî xwînerên kovarê ye.

Di vê hejmarê de Armanc Dayan hevpeyvîneke berfireh bi derhêner Emîr Xulamiyî re kiriye ku tê de serpêhatiya Xulamiyî, rewşa sînemaya Rojhilatê û bi giştî behsa sînemaya Kurdî hatiye kirin.

Her wiha Engîn Sustam jî bi xwendineke akademîk, bi serenavê “li Xaçerêya Hêmayên Dekolonyal Sînemaya Kurdî” li ser taybetmendîya antî-kolonyal ya sînemaya Kurdî nivisiye.

Her wiha sînemavan Ardîn Dîren jî bi nivîsa xwe ya “Hewrikên di tûrikê Jonas Mekas” de behsa sînemaya Jonas Mekas kiriye û manifestoya ku ji bo 100 salên sînemayê nivîsandiye, nirxandiye. ***-Ozgurpolitika***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Afirandin** | **Xuliqandin, peydakirin, çêkirin, sazkirin.** |
| **Afirîner** | Xuliqkar, peydaker, jîr, jêhatî. |
| **Arîşe** | Pirsgirêk, kêşe, mesele, muşkîle, nexweşî, alozî... |
| **Heman** | Eynî, her ew kes/tiş: Ev her du heman tişt in. Di heman saetê de hat. |
| **Hemin** | Teqez, muheqeq: Hemin ezê biçim, lê dixwazim tu jî werî. |
| **Hêman** | Bingeh, hîm, binyad. |
| **Havên** | Tişta ku bi alîkariya wê, tişteke din çêdibe. Heyvan, mastê ji bo meyandina şîr, hevîrtirşik, tovê mêran. |
| **Kêşe** | Pirsgirêk, mesele, muşkîle, nexweşî, alozî... |
| **Organîze** (Fransî) | Rêxistin, tenzîm: Konferansek organîze kirin. |
| **Tanker** (Fransî) | Kamyon yan jî kêştiyên ji bo kişandina berhemên petrolê, avê û tiştên rohn. |

## Heqîqeta Rêber Apo




Hevseroka Konseya Rêveber a KCK’ê Besê Hozat diyar kir ku Rêber Apo mîna ku hesabê kiryarên bi serê hevalên xwe yên keç, xwişkên xwe yên di zarokatiyê de bipirse, berê xwe da azadiya jinê. Her ku ber bi azadiya jinê ve meşiya, jinan jî berê xwe dan Rêber Apo. ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1015 | 20-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# ’JIN JIYAN AZADÎ’ NE TENÊ DIRÛŞMEYEK E, FELSEFE YE

‘Jin, jiyan, azadî’ ne bi tenê dirûşmeyeke, di heman demê de wateya avakirina îrade, hêz û rêxistina jinê ye. Mîmarê dirûşmeya ‘Jin, jiyan, azadî’ jî, Rêberê Gelan Abdullah Ocalan e. Wî di nirxandin û analîzên xwe yên ji dawiya salên 1980 û heta îro, bal kişand ser vê mijarê ku li Kurdistanê ev her du peyv koka wan yek e azadîya jinê tê wateya azadbûna jiyanê.




## Gerîlayên HPG û YJA-Starê: Me di her alî de serkeftin ji xwe re kiriye armanc



Gerîlayên HPG û YJA Starê diyar dikin ku wan di 44’emîn salvegera damezrandina PKK’ê de jî di her warî de serkeftin ji xwe re kirine armanc. ***R-5***

## Xwepêşandanên gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê didomin



Serhildanên gel yên li Rojhilatê Kurdistan û Îran bê navber dewam dikin, Roj bi roj serhildan firehtir dibin û hejmara welatiyên li ser destê rêjîma Îranê tên qetilikirin, desteserkirin û girtin zêde dibin. ***R-3***

**‘Li hemberî tundiyê têkoşîna herî baş xwenasîn e’ R-2**

## `Şoreşa Rojava ji bo jinê bû vejîneke nû`



Endamê Kordînasyona Kongra Star a herêma Şehbayê Necah Hisên diyar kir ku Şoreşa Rojava ji bo jinan bû vejîneke nû û got, jinên herêmê bi saya felsefeya Rêber Apo bûn pêşengên civakê ***R-2***

## Bendava Tişrînê ji ber birîna avê rojane 17 saetan disekine



Dewleta Tirk a dagirker kêmkirina ava çemê Firatê ji ser xaka Sûriyê didomîne. Di encamê de rojane Bendava Rojava (Tişrîn) 17 saetan nikare bixebite. ***R-6***

## Fîlma ‘Kobanê’ li Qamişlo bû



Fîlma ‘Kobanê’ ya behsa berxwedana Kobanê ya li dijî çeteyên DAIŞ’ê dike, piştî ku cara yekem li Kobanê hat pêşandan, li Qamişlo bû. ***R-7***


**Armancên teqîna..** Ahmed Aktaş *R-5*


**Tunditujiya Dijî Jinê** Hafiz Ahmet Turhalli *R-6*


**Planeke nû ya bi xûn** Farûk Sakik *R-4*

# `Şoreşa Rojava ji bo jinê bû vejîneke nû`

Endamê Kordînasyona Kongira Star a herêma Şehbayê Necah Hisên diyar kir ku Şoreşa Rojava ji bo ji bo jinan bû vejîneke nû û got, jinên herêmê bi saya felsefeya Rêber Apo bûn pêşengên civakê.

**Zana Roj/ Şehba**

Beriya sedê salan û heya niha, li tavahî aliyên cîhanê zext û tundiyê li ser jinan tê ferizkirin. Di bin şert û merçên cur be cur de, li ser destê sîstem, civak û malbatê tê tunekirin û helandin. Bi vêketina çirûska Şoreşa Rojava re û li ser bingeha felsefeya Rêber Abdullah Ocalan, ji bo azadiya jinê gavên girîng hatin avêtin. Di şoreşa Rojava de, ev fikir weke şoreşa jin hat destpêkirin, her wiha jinê xwe têde îsbat kir û ber bi azadiya xwe ve meşiya, bi taybet di vê Şoreşê de para jinên ereb ya herî mezin bû, jina ereb di kesayet û îdeolojiya xwe de guhartinên mezin dan çêkirin, ev yek jî hêşt ku daha zêdetir xwe nasbike û têkoşîna hebûna xwe da meşandin, lewra jî em dibînin ku jina Kurd û Ereb di asoyên vê şoreşê de cih digirin.

Derbarê girîngiya Şoreşa Rojava ji bo azadiyê jinê û rola jinêdi şoreşê de endama Kordînasyona Kongira Star a herêma Şehba û Efrîn Necah Hisên ji rojnameya me re axivî.

**`Hewildana qirkirina jinan dihat kirin`**



Nacah Hisên diyar kir ku bi sedê salane ku jin ji tevayiya mafên xwe bê pare û got: "Beriya 5 hazar sal jina xwedawend a ku temsîlkarê aşîtî û heksengiya civakî dikir, xwedî hest û xweşikbûyînê bi serdema kapîtalîzmê re ji aliyê zilam ve hat bêrolkirin. Dîroka ku em îro tê de jiyan dikin şahidê qetilkirin û tundiya ku bi hezar salan ji aliyê civak û olê de li ser jinan hatibû ferzkirine, di bin navên cuda de weke hincet zarokên jin dihatin binax kirin ev mînaka herî berbicava ku ji hezar salan ve dixwastin jinê qir bikin."

**`Di bin navê civakê de xwesatin jinê nezan bikin`**

Necah da xuyakirin ku jinên Ereb ji aliyê civakê ve rol û hebûna wê hatibû tunekirin û wiha got: "Bi taybet di civaka Ereb de, zagonên hişk di derbarê jinê de tên ferzkirin, di bin şertên irf, edet û kevneşopiyên civakî de neheqiyên tund li ser jinê tên kirin, di hişmendiya civakê de mêr yekser xwedî biryar e, xurtên ciwan çiqas temen biçûkbin lê dikarin bi hêsanî biryaran di debarê jin de bidin, diyardeya zewaca bi temenê biçûk pir li pêş e, ev yek jî pir bi zanabûn dihat kirin, da ku jin negihîne temenê xwefikirandin û xwezanebûnê. Herwiha dixwazin her tim di bin hukmê zilam de jiyan bike".

**`Felsefeya Rêber Ocalan ji bo jinan zayîneke nû bû`**

Necah di axaftina xwe de anî ziman ku bi naskirina felsefeya Rêber Abdullah Ocalan me hîs kir ku mafê jin heye û dikare xwedî li xwe derbikeve û wiha domand: "Vêketina Şoreşa Rojava ji bo me û tavahî jinên li herêmê jiyan dikin, zayîneke nû bû, di me de hêz û îradeya têkoşînê da avakirin, Şoreşa

Rojava bi xwe re şoreşa bîrdoziya azadiya jin da avakirin, me xwe di vê bîrdoziyê de bi rêxistin kir û hewildana têkoşîn û guhartina hişmendiya hezarê salan kir, ev yek hîşt ku jin bi hemû pêkhateyên xwe di vê şoreşê de bibin xwdî biryar û pêşengtiyê bikin".



**`Jina pêşeng tê ji aliyê dagirker û desthilatdaran tên hedefgirtin`**

Endama Kordînasyona Kongira Star a herêma Şehbayê Necah Hisên da zanîn ku hêzên dagîrker bi hedefgirtina jina pêşeng dixwazin şoreşa Rojava ji cewherê wê dûrbixin û axaftina xwe wiha qedand: "Asta zanabûn û pêşketina jin di hundir vê şoreşê de daye avakirin, niha bûye weke topeke ji agir û di çavê dijmin de pêketiye, lewra jinên pêşeng ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve di herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyê de tên hedefgirtin, dagirkerî bi van êrîş û kiryaran bê exlaqî dixwaze hêz û îradeya ku Rêbe Ocalan di kesayeta jinê de daye çandin têk bibin."

# 'Li hemberî tundiyê têkoşîna herî baş xwenasîn e'

**Endama Komîteya Jineolojiyê ya Mexmûrê Songul Guler diyar kir ku dema jin li hemberî tundîtûjiyê xwe bi rêxistin bikin û azad bibin, wê xweza û civak jî azad bibe, bi wê yekê re dê hemû şer, kuştin û tundîtûjî vala derbikevin.**

Bi boneya nêzbûna 25'ê Mijdarê roja têkoşîna li dijî tundîtûjiya li dijî jinan, li seranserî cîhanî gelek çalakiyên cur be cur tên lidarxistin. Der barê têkoşîna li dijî tundîtûjiya li hemberî jinan de Endama Komîteya Jineolojiyê ya Mexmûrê Songul Guler axivî û destnîşan kir ku jin bi têkoşîn û xwerêxistinkirinê dikarin pêşî li tundîtûjiyê bigrin.

**'Tûndiya li ser jinê bi pergalî û birdozî ye'**

Endama jineolojiyê Songul Guler diyar kir ku di roja me ya îro de tudîtûjiya li hemberî jinan pergalî û bîrdozî ye û got: "Tunditûjiya li ser jinan tenê em bi fizîkî bigrin dest dê kêm bimîne. Hem pergalî ye, hem jî bîrdozî ye. Çima tundîtûjî li ser jinan tê kirin û ferz tê dîtin avakirina zîhniyet û pergalek wê heye. Em nikarin weke bûyerek bigrin dest, em dikarin bibêjin jin li ku derê bin bila bin li kîjan dewletê dibin bila bin, li ku kîjan qanûn hebin jî rastî tundîtûjiyê tên. Jin li ku derê rastî tundîtûjiyê tên, li malê, ji aliyê bav, mêr û bira ve, li bajaran, li taxan, gundan rastî tudîtûjiyê tên.

**`Jin di hedefa êrişên mêr-dewletê de ye`**

Songul Guler da zanîn ku pergalên hatine avakirin xwedî aqilê mêr in û bi kedîkirina jinan tundîtûjiya li hemberî wan rewa dikin û wiha domand: "Piştî şaristaniyê û şûnde pergal bi aqil û çanda mêr hatine avakirin. Ji bo wê jî xala yekem kedîkirina jinan bû, ew ruhê azad, ew enerjiya bi coş, jiyana bi reng, zîhniyeta civakî, ew exlaq û çanda civakî pêwîst bû bihata kedîkirin.



Bi taybetî çeka yekem a pergala bavksalariyê tundîtûjî bû. Vê yekê bi bîrdoziya xwe xurt kirin heta ji bo vê yekê gelek tişt gotin derxistin û heta roja me ya îro jî dibêjin 'Lêdan ji cenetê derketiye' 'Li keça xwe nexî wê li çoka xwe bixî' bi zimanên cuda cuda ev gotin di nava civakê de rewa kirin. Bi van gotinan êdî weke qedera jinan a ku divê neyê guhertin bi hezaran salan wisa berdewam kirin. Di dewletan de qanûnên ku derdixin hemû li gorî wê ava kirin. Jin di qadên aborî, siyasî, çand û hunerê, di hemû qadên jiyanê de rastî tûndîtûjî, neheqî, lêdan û kuştinê tên. Em bibêjin jinek karker be hemû keda wê tê xwarin û nikare heqdestê keda xwe bistîne. Bi taybetî di şerê ku îro li Rojhilata Navîn tê meşandin de hedef jin in û weke xenîmeta şer şer tên dîtin, rastî tacîz û tecawizê tên, di bazaran tên firotin ev dîrok gelek ji me ne dûr e, di van salan û di van kêliyan de em hê jî rojane van bûyeran dijîn."

**'Xwe rêxistinkirin parastina herî baş e'**

Songul Guler destnîşan kir ku divê jin xwe bi rêxistin bikin û baş nas bikin, bi têkoşîna xwe dikarin li hemberî tundîtûjiyê bisekinin û wiha got: "Dema êrîşek li cihek çêdibe destpêkê dest davêjin jinan, çawa ku welat tên dagirkirin. Divê em vê baş bizanin tundîtûjî ne qedera me ye, tu caran jî me tundûtûjî heq nekeriye. Divê di hemû aliyan de em xwe biparêzin. Di aliyê zanist, xwenaskirin, çand, exlaq û sekna xwe de divê em xwe bi rêxistin bikin û biparêzin, mekanîzmayên parastina xwe bidin avakirin. Divê em îqna bibin ku em ne kesên wisa ne werin kedîkirin û bibin malê kesan. Divê em xwedî wê zanînê bin. Ji bo vê jî têkoşîna herî baş xwenaskirin e, xwebûn e, naskirina cinsê xwe ye, xwebûn e."

Sungul Guler a li dijî tundiyê bal kişand pêwistiya xwe parastinê ya jinan, wiha dom kir; "Xweparastina herî baş derxistina holê ya zanista çanda jinan, aqilê jinan, zanista ruh û enerjiya jinan û rêxistinkirina hemû jinan e. Pêwîst e di vî alî de em bi rêxistinkirin bi zanîstî bi çand û exlaqê jin, dayikê tevbigerin. Li hemberî van êrîşên ku li ser me tên meşandin em hem di aliyê fikir de hem jî di aliyê zanistê de rêxistinên xwe bidin avakirin. Wê demê dê zarok jî ji bin tundîtûjiya civakê û mezinan derbikevin. Ger jin azad bibin wê xweza jî azad bibe, wê civak jî azad bibe, wê demê wê hemû şer, kuştin û tundîtûjî vala derbikevin."

***JÎNHA***



# Fîlma 'Kobanê' li Qamişlo bû

Fîlma 'Kobanê' ya qala berxwedana Kobanê ya li dijî çeteyên DAIŞ'ê dike, piştî ku ewil car li Kobanê hat pêşandan, li Qamişlo bû.




Filma 'Kobanê' ya derhênêriya wê ji aliyê Ozlem Yaşar ve hatiye kirin bi Komîna Fîlm a Rojava re hatiye çêkirin duh êvarê li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunera li bajarê Qmaişlo-Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tevlîbûna bi sedan kesan hate pêşandan. Filîma Kobanê beriya vê demekê li bajarê Kobanê hatibû pêşandan, duh jî bi eleqedariyek mezin a filmhêzan li Qamişlo hat pêşandan.

Film berxwedan û têkoşîna gelê kurd li dijî çeteyên DAIŞ'ê nîşan dide. Her wiha di filîmê de sekna Fermandar Zehra û şervanên YPJ/YPG li hember hişmendiya DAIŞ'ê çawa şer kirine û DAIŞ'ê têkbirine nîşan dide.

Lîstokvana filma Kobanê, Necbîr Xanim a di pêşandana filmê de amade bû nêrîna xwe bi me re parvekir.

**'Film beşek ji şer û berxwedana Kobanê nîşan dida'**

Necbîr Xanim di destpêka axaftina xwe de naveroka filîmê nirxand û destnîşan kir ku film berxwedana Kobanê û şehîdên Kobanê nîşan dide û teqez kir ku armanca wan di vê filmê de ew bû ku rastiya ku li Kobanê hatibû jiyîn nîşanî tevahî kesan bidin û wiha bal kişand li ser rola jinan di filmê de: "Rola jinan di filîmê de sereke bû, bi taybet rola Zehra pir diyarde bû ku jinek şoreşger çawa şer bi rê ve dibe û bi fermandar û pêşengtiya jinê Kobanê bi ser dikeve."

**'Em dixwazin tevahî kes berxwedana Kobanê nas bikin'**

Necbîr Xanim da zanîn ku ew dema rol di filmê de digirt gelê Kobanê pir alîkariya wê kirine û diyar kir ku di her sehneya ku dileyîst ew ruhê Kobanê dijiya û destnîşan kir ku ew rola şehîd Asmîn lîstiye û rola wê lîstîn jî barek mezin daye ser milê wê û wiha axaftina xwe domand: "Di gava yekem de ez gelek li ber xwe diketim ku ez ê çawa egidî û berxwedana wan jinên şoreşger nîşan bidim. Dema ez di kolanên Kobanê de derbas dibûm, bi rastî jî min ruhê Asmîn li wan kolanan dijiya. Di filmê de jî diyar dibe ku kêfxweşî, êş, moral, serkevin û kelecan bi hev re tên jiyîn. Dema me film dikişand, hin hevalên me beşdarî şerê Girê Spî û Serêkanî bûn û hin ji wan şehîd ketin. Ji bo ku xeyala wan jî di nivî de nemîne me soz da ku em filîmê xwe bi encam bikin ku îro amadebûye û gelê me qehremaniya Kobanê temaşe dikin. Heta niha li bajarê Kobanê, Minbiç, Reqa, Şehba, Hesekê, Rimêlan, Dêrîk û niha jî li bajarê Qamişlo tê pêşandan. Em dixwazin tevahî cîhan berxwedana şervanên Kobanê bi nasin." - ***JÎNHA***

# Tesîra li ser Gustav Klimt

**Gustav Klimt weke endamekî "Koma Sezession" ya Viyanayê jî tê zanîn. Ew di bin tesîra gelek şêwekaran de maye. Her wiha gelek şêwekar jî di bin tesîra wî de mane.**

Gustav Klimt weke şêwekarekî Awusturyayî tê zanîn. Wî di temenekî ciwan de bala xwe daye ser bizava sembolîzmê û art nouveau (pêla "hunerê nû"). Berhemên ku wî afirandine bêhtir di bin tesîra van bizavan de mane. Di vî warî de tabloya wî ya bi navê "Der Kuss" (Maç/Ramûsan) gelekî navdar e û hema bêje, êdî ew bûye îkoneke populer. Wî ji xeynî tabloyan, gelek dîwar jî resmandine, yanî xêzên wî yên li ser dîwaran jî gelek in.

Lê mijara sereke ya xebatên wî, weke ku di tabloyên wî de jî xuya dike, jin e. Nexasim jî li ser anatomi û bedena jinê hûr dibe. Wî di tabloyên xwe de her tim jineke ku wî jê hez kiriye, weke model bi kar aniye û ew xêz kiriye. Her wiha xemlên dekoratîf ên di tabloyên wî de jî navdar in û tabloyên wî xweşiktir dikin. Li gorî lêkolînan, derketiye holê ku wî di hinek tabloyên xwe de "zêrê xwerû" jî bi kar aniye.

Di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de bi destê Nazîyan gelek tabloyên wî yên li Zanîngeha Viyanayê tên rûxandin. Lê dîsa jî ew bi awayekî tên restorekirin û heta roja îro dimînin. Gustav Klimt ku weke endamekî "Koma Sezession" ya Viyanayê jî tê zanîn, di bin tesîra gelek şêwekaran de maye. Her wiha gelek şêwekar jî di bin tesîra wî de mane. Nexasim jî şêwekarê navdar Egon Schiele gelekî maye di bin tesîra karên wî de. Egon Schiele di 28 saliya xwe de ango di temenekî ciwan de miribû.

**Tesîra Van Gogh û Matisse**

Di van demên dawiyê de Muzeya Van Gogh ya li Amsterdamê pêşangeheke bi navê "Golden Boy Gustav Klimt: Inspired by Van Gogh, Rodin, Matisse" li dar dixe. Muzeya Van Gogh bi vê pêşangehê hewl dide ku tesîra Van Gogh, Auguste Rodîn û Henri Matisse ya li ser Gustav Klimt nîşan bide. Di pêşangehê de berhemên Gustav Klimt yên bi navê "Der Kuss" (1908), Water Serpentes II (Marên avê II)" (1904), "Judith" (1901) û "Emilie Floge" (1902) dê werin nîşandan. Li gel van berhemên wî 36 berhemên wî yên din jî wê werin nîşandan.

**Bi Van Gogh kontrasta tabloyên wî diguhere**

Li gorî nûçeya The Art Newspaper, Gustav Klimt sala 1903'yan hunerê Van Gogh kifş dike û di bin tesîra karên wî de dimîne. Tesîra Van Gogh, di berhemên wî yên salên 1910'an de xwe dide der. Xasma jî kontrastên rengên wî yên li ser tabloyan diguherin û bêhtir bi hêz dibin. Berhema bi navê "The Pink Orchard (Dehla avorî/pemba)" (1988) ya Van Gogh, bûye îlhama tabloya wî ya bi navê "Aveneu to Schloss Kamer (Rêya ber bi Qesra Kamer ve)" (1912). Her wiha kulîlkên di tabloya Van Gogh ya "Daubigny's Garden (Baxçeyê Daubignyê)" (1890) de û yên di tabloya "Italian Garden Landscape (Dîmenê Baxçeyên Îtalî)" (1913) de ya ku Gustav Klimt çêkiriye, pirr dişibin hev û vê tesîrê nîşan didin. Pêşangeh her çiqas li ser sê hunermendan be,



her sê hunermendên ku Gustav Klimt di bin tesîra wan de maye, di heman demê de tesîra şêwekarên weke Paul Cézanne, Édouard Manet, Claude Monet, Edvard Munch, Georges Seurat, Henri de Toulouse-Lautrec û James Abbott McNeill Whistler jî nîşan dide. Di pêşangehê de 3 berhemên Van Gogh, 5 berhemên Rodîn û berhemeke Matisse tê nîşandan.

**Tabloyên wî jî bûn hedefa çalakvanan**

Di van rojan de ku çalakiyên li muzeyan pirr bi pêş ketine, tabloya Gustav Klimt jî bû hedefa çalakvanên avûhewayê. Beriya bi çend rojan, aktivîstên avûhewayê li Muzeya Leopold ya Viyanayê çalakiyek li dar xistibûn û di vê çalakiyê de tiûtekî weke qetranê avêtibûn ser tabloya Gustav Klimt a bi navê "Death and Life (Mirin û jiyan)". Çalakvanan qetraneke reş firfirandibû ser tabloyê û tablo herimandibûn. Rayedarên muzeyê ragihand ku vê çalakiya hanê ti zirar li tabloya Gustav Klimt nekiriye.

Pêşangeha Gustav Klimt a li Amsterdamê wê heta 8'ê Çileyê 2023´yan dewam bike. Piştî Amsterdamê heman pêşangeh wê li "Lower Belvedere" ya Viyanayê jî li xelkê bê vekirin.

***Ozgurpolitika***

# Hunerê hêviya vegera Serêkaniyê

**Vîrona Evdikê piştî ku Serêkaniyê hate dagirkirin, ji bajêr derdikeve lê niha xewna vegerê li Serêkaniyê xêz dike û dibêje, "Ez jinek im ku ji zikê şoreşa Rojava hatime dine. Kes nikare rîşa min bişikîne."**

Vîrona Evdikê sala 2003'yan li Serêkaniyê ya dagirkirî ji dayik bûye. Piştî ku bajarê wê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve tê dagirkirin, tevî malbata xwe koçber dibe û li Qamişloyê bi cih dibe. Her wiha di Komîteya Têkiliyan û Lihevkirinan a Kongra Star de wergêra Ingilîzî ye.



Vîrona dibêje: "Sala 2016`an, hezkirina şoreşa jinan ji bo min peyamek bû ku êdî tablyonên min xwedî wateyên kûrtir in. Xwezaya bajarê min gelekî alîkariya min kir. Ew û jin di tabloyên min de cihekî mezin digirin, ji ber ku ji hev cuda nabin."

**Tirkan atolyeya wê dagir kir**

Vîrona ji sala 2016'an heta 2019'an bi dehan wêne xêz kirin, lê ew berhemên wê tevî atolyeya wê hatin talankirin. Vîrona atolyeya xwe wek dinyaya xwe ya taybet bi nav dike: "Di atolyeya xwe ya li Serêkaniyê de min gelek tablo xêz kirin. Ew stargeha min bû, ew dinyaya min bû."

Di 9'ê Cotmeha 2019'an de Serêkaniyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hat dagirkirin. Ew roj ji bo Vîronayê rojeke reş bû: "Bajarê min tarî bû û dagirkeriyê hemû reng ji atolyeya min dizîn. Min nekarî tiştekî bi xwe re bibin. Tabloyên min li wir mane. Ji bo min ew şikestinek bû."

Vîrona sala 2021'ê bi du tabloyan beşdarî pêşangeha li Qamişlo bû û sala 2022'yan jî beşdarî pêşangeheke din bû.

Vîrona niha wêneyê zarokê bi navê Mihemed xêz dike ku di êrişên bi çekên kîmyewî de ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve li Serêkaniyê, birîndar bûbû: "Bi rêya tabloyên xwe ez êşên şêniyên Serêkaniyê tînim ziman. Ji cîhanê re xuya dikim çi bi serê bajarê min de hatiye. Dixwazim qîrîna Mihemed di wicdanê cîhanê de zindî be. Ji ber dagirkeriyê, xewnên me hatin talankirin. Ez soz didim ku bi rîşa xwe xizmeta doza jinan û gelê xwe bikim. Ez dev ji xewna xwe ya vegerê bernadim."

***ANHA***

# Bendava Tişrînê ji ber birîna avê rojane 17 saetan disekine

Dewleta Tirk a dagirker kêmkirina ava çemê Firatê ji ser xaka Sûriyê didomîne. Di encamê de rojane Bendava Rojava (Tişrîn) 17 saetan nikare bixebite.



Dewleta Tirk a dagirker êrişên li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê navber didomîne. Li kêleka wê jî para sûriyan ji ava çemê Firatê didize û di encamê de ji bo jiyana bi milyonan mirovan û jîngehê xetereyên mezin çêdike.

Li ser mijarê gerînendeyê Bendava Rojava Hemod El Hemadîn axivî. El Hemadîn got: "Bandorên ji ber kêmbûna ava golan û çemê Firatê li Sûriyê her kes dizane. Ev yek nêzî 10 mehan bê navber dewam dike. Ava çemê Firatê ji sedî 75 kêm bûye."

El Hemadîn wiha domand: "Ava ji Tirkiyê ve tê, ji nîvê rêjeya hikumeta Şamê û dewleta Tirk diyar kiriye, kêmtir e. Di çirkeyekê de divê 500 metrekab berda, lê hin caran tene 168 metrekaban berdide."

**`Çem dibe çirav `**

Qadên herî girîng ku zirar ji ber kêmkirina ava çem dîtine; kehrebe, avdanî û ava vexwarinê ne.

El Hemadîn li ser vê yekê got: "Di havînê de ji ber kêmbûna ava çemê Firatê, avdan, ava vexwarinê û kehrebe pir kêm bû. Di encamê de ji bo dayîna kehrebeyê gol tên bikaranîn. Rêjeya gola Bendava Rojava 4 metre kêm bûye û gola bendava Firatê ya mezin jî niha 6 metre kêm bûye."

El Hemadîn diyar kir ku kêmbûna metirsîdar û bikaranîna ava golan, çem veguherandiye çîravan ku ev yek herî zêde li Dêrazor û Reqayê tê dîtin.

**`Kehrebe di asat herî kêm de tê dayîn`**

Hemo El Hemadîn li ser rewşa dayîna kehrebeyê jî got: "Niha Bendava Tişrînê rojane 17 saetan disekine û tenê 7 saetan dixebite. Li şûna pêxistina 6 turbînan, tenê 2 torbînên bi 140 megawatt tên bikaranîn. "

El Hemadîn destnîşan kir ku xebitîna 2 turbînan têrê nake, ji ber ku pêdiviya herêmê bi zêdebûna kehrebeyê heye



û nexebitîna Bendava Tişrînê, tê wateya herêm bê kehrebe bimîne.

El Hemadîn da zanîn ku ev derfet hene lê ji ber av tune ye nikarin enerjiyê 24 saetan bidin û wiha got: "Êdî gol jî rojane kêm dibin. Ne ji hevkariya nivîsgeha eneriyê û rêveberiya giştî ya bendavan bûya û lêkolîna li ser bernameya dayîna kehrebeyê bûya, dê bendava Tişrînê û ya Firatê ji zû de ji xizmetê derketana."

El Hemadîn eşkere kir ku xebat ji bo parastina ava vexwarinê ku karê destpêkê ye, her wiha dayîna kehrebeyê dewam dike.

Hemod El Hemadîn di dawiyê de got divê şênî rewşa herêmê li ber çavan bigirin û wiha got: "Bendav bi avê dixebitin lê av tune ye anku ne pêkan e bendav bixebite." ***ANHA***

# Di qada tendûristiyê de jin û zarok rastî tundîtûjiyê tên

**Li Idliba ku di bin kontrola dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê de ye, di aliyê tendirustiyê de jin rastî tundîtûjiya fîzîkî û derûnî tên. Li nexweşxaneyan ji ber nêzîkahên xirab û îhmamkariyê, gelek jin zarokên xwe winda dikin û jiyana xwe ji dest didin.**

Şer û wêrana li bajarê Idlibê ku dikeve Başûrê Sûriyeyê û di bin kontrola dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê de ye; herî zêde bandora xirab li ser jin û zarokan çêdike. Di qada tendirustiyê de tiştên tên jiyîn di asta îşkenceyê de ne, cihê welidîna zarokan bi taybet jî cihê ku herî zêde jin bi şîdetê re rû bi



rû diminîn e. Jinên ku rastû nêzikatiyên xirab û îşkenceyê tên yan jiyana xwe ji dest didin yan ji bi komplîkasyonên cîdî re rû bi rû dimînin.

Jinên ku di qada tendirustiyê de rastî nêzîkatiyên xirab hatine axivîn.

**'Ez rastî tacîzê hatim'**

Fidaa Al-Sanbourî ya 25 salî diyar kir ku piştî emeliyata welidinê bijîjk cihê birînê pênc nekir û dirut ji ber wê gelek êş kişand û di dema welidînê û piştî wê de rastî tacîza bijîjk hatiye û wiha got: "Ji ber tengasiya aboriyê, em nikarin biçin nexweşxaneyên taybet, ew nexweşxaneyên ku em diçin jî bijîjk wekî tê xwestin li me mêze nakin û ez di wê hêviyê de me ku careke din van tiştan dubare nejîm."

**'Çend roj beriya welidînê min zaroka xwe winda kir'**

Haneen Al-Shehadeh a 35 salî ku li Idlibê dijî, da zanîn ku di pêvajoya nehmehî ya ducaniya xwe de, beriya çend rojan zaroka xwe winda kiriye û wiha got: "Dema ev xetaya tibî tê bîra min ez gelek xemgîn dibim. Di destpêka meha nehem de min daxwaza bijîjk a sezeryanê qebul nekir, min got hê zû ye, bijîjk got pitik miriye."

**'Canê jinan ji nedîtî ve tê'**

Haneen Al-Shehadeh bal kişand ser bihayê zêde yê nexweşxaneyên taybet û wiha domand kir: "Ji ber bihayê zêde yê nexweşxaneyên taybet em nikaribûn biçin wan, rewşa me ya aborî gelek xirab e, li nexweşxaneyên bêpere jî ji ber îhmalên personelên tendirûstiyê, canê me ji nedîtî ve tê hesibandin. Xwezî em ji vê rewşê êdî rizgar bûbûna. Gelek jin dema ku zarokên xwe diwelidînin, di korîdorên nexweşxaneyan de demdirêj di rêza muaneyê de dimînin. Gelek demên din hinek jin di korîdorên nexweşxaneyê de yan jî li erdê zarokên xwe diwelidînin. Ji ber ranzeyên vale tune ne û pêwîstiyên jinan nayên bicihanîn, ev kêmasiyek gelek mezin e. Canê jinan ji nedîtî ve tên."

**'Jinên ku xwinbûna zêde derbas dikin jiyana xwe ji dest didin'**

Maysa al-Hattab a 31 salî behsa jinek ku êşên welidînê dikişand û nêzakiyên li hemberî wê kir û got: "Jinek ku di korîdorên nexweşxaneyê de êşên welidînê dikişand û ji personela nexweşxaneyê alîkarî xwest, êşa wê ya zêde hebû, digiriya. Ruxmê van hemûyan alîkarî nedan wê. Berovajî wê, rastî heqaretê hat. Wê sûcdar kirin gotin tu mezin dikî. Piştre ji ber xwînbûna zêde wê jinê jiyana xwe ji dest da. Ew tişta ku hat jiyîn di derceya yekem de sûceke îhmalê ye."

**'Perestar ez biçûk xistim'**

Sarah Al-Karima ya 36 salî li kampa Qah a Idlibê wiha behsa bûyera ku bi serê wê de hatiye dike: "Kurê min ê pênc salî ket û serê wî şikest, em çûn navenda tendirustiyê, kes bi me re eleqedar nebû, bi israrek zêde perestarek dengê xwe bi ser de min bilind kir û bi îhmalkirina birîna kurê min ez sûcdar kirim. Di dema dermankirinê de birîna serê kurê min netevizand û dirût, zarokê min êşek gelek dijwar kişand."

**'Di pêvajoya welidinê de divê piştgiriya jinan were kirin'**

Derûnînas Walaa Al-Hamouda ya 44 salî der barê mijarê de ev nirxandin kir û got: "Di sektorên tendirustiyê yên taybet û dewletê de, bi taybetî sektorên serbixwe de dema welidînê, îhmal û tundiyek heye û ev rastiyek e. Jinên ku ducanî di pêvajoya ducanîtiyê de di şert û mercên hesas de derbad dibin. Bi xirabî nêzbûna jinan dibe sedem ku di demên pêş de ji wan re bibe saw. Ev tecrubeyên jinan dibin sedema durbûna ji ducanîbûnê û naxwazin bibin xwedî zarok."

**'Divê jin li hemberî tundiyê bêdeng nebin'**

Derûnînas Walaa Al-Hamoud destnîşan kir ku divê jin li hemberî tundîtûjiya fîzîkî û derûnî bêdeng nebin û wiha domand: "Divê jin li hemberî tundiya li wan û zarokên wan tê kirin, bêdeng nebin, di vê mijarê de saziyên eleqedar divê bişopînin ku li cihên welidînê çi diqewime û li wê derê jin rastî kîjan mumeleyan tên. Divê ev yek bi yek werin şopandin, tedbîrên pêwîst werin girtin.

***JİNHA***



## Tunditujiya Dijî Jinê

Hafiz Ahmet Turhalli

Di sala 1960 de li Komara Domînîk ku rêveberiya wê kesê dîktatorê yê binavê Rafael Trojillo dihate naskirin, sê xuşkên tekoşer bi îşkence û serîjêkirinê di 25 Mijdarêde hatin qetilkirin. Ji ber vê buyerê, ew roj wek roja dijî tundiya li ser jinê, di saziya Neteweyên Yekbuyî de, di sala 1999`an de hate pejirandin û neha li seranserî cîhanê tê bi bîranîn.

Wek hûn jî dizanin di zilm û zordarîyê de, ji dewletan bigre heta kesayetan, ji bo nefsa xwe mezin bikin û desthelatdar bimînin, hemû alî xwe li ser vê yekê ferz dikin. Mixabin bi şiklên cuda be jî, xweferzkirin di nav Mirovahîyê de bi giranî, hatiye bi cîh kirin. Ev tundî carnan bi navê ol, carna binavekî din derdikeve pêşberî mirovahiyê. Hem di dîroka mirovahîyê de û hem jî vê serdemêde ev pirsgirêk bi cureyên ziravtir û kurtir berdewam dike.

Pirsgirêka desthelatê bûye nexwşîyeke derunî û bûye bela serê mirovahiyê.

Dewlet xwe li ser hemwelatiyan ferz dikin, partî xwe li ser endamên xwe ferz dikin, şêx xwe li ser mirîdan ferz dikin, mela xwe li ser civakê ferz dikin, muxtar xwe li ser gundîyan ferz dikin, bav xwe li ser malbatan ferz dikin û zilam jî, xwe li ser jinan ferz dikin. Bi hezarê salane ev nêzikbun bûye sîstemeke di malbata mirovahiyê de.

Ev sîstema han ya desthelatdariyê di nava mirovahîyê de, bê dadî û bê rawiştî bi xwe re ava kiriye.

Di bengehê de Ola Îslamê ferzkirin û zordariyê napejirîne, bihevre îstîşare, edaletê, merhemetê, heskirin û bihevre karkirinê pêşniyar dike. Xwe ser hevdû ferz kirin û îrada însanî nedîtinê Îslam napejirîne. Lewra Xwedê ji bo hemû mirovan dibêje; ew xelîfeyên min in. Jin mêr tu cudahî nîne. Jin jî, zilam jî, xelîfeyên Xwedê ne. Fermanên Qur'anê hevdû temam kirine, ne ku desthelattdariyê li ser hevdu avakirine.

Di civaka mirovahiyê de yên herî zêde tên perçiqandin jinin! Jinên Kurd hezar car zêdetir ji jinên dîtir, ji ber şer tên perçiqandin. Dijminê gelê me ji bo ku me bê kesayet bihêle, destdirêjiya qirêj li ser keç û jinên me dike. Divê were zanîn: Jin jiyane, jin merhemete, jin dayîke! Destdirêjiya ser jinê, kuştin û tundûtujiya ser jinê, di heman demêde, dest dirêjiya jiyana mirovahiyêye.

Bi taybet tundûtujiya ser jinan, gîhaştîye radekî ku, tehemmula mirovên xwedî wijdan ku mirovahiya xwe ji dest nedaye, nemaye! Kevir, dar, erd û asîman qêrîna wane, dibêjin tundutujiya ser jinê êdî bese!

Her Roj dayik, keç û jinên me, destdirêjî li wan tên kirin, tên îşkence kirin û kuştin. Qur'ana pîroz û ola Îslamê, destdirêjî, kuştin û neheqîya li ser rihberan qedexe kiriye. Qedrê mirov bilind û berz nirxandiye. Dij derketina hemu cureyên zilm û zordariyê li me ferz kiriye.

Divê demlidest tundîtujiya dij Jinê bê rawestandin.

Hedîs:

`…Kê ji we dema zarokên keç xwedî dike, rubiruyê henekî zehmetiyan were, ewê xwedîderketina wan zarokên qîzîn, ji bo wî bibe parastina ji agirê Dojehê. ` Buhari Zekat, 10.

`Qenctirînên we kesê ji bo hevjîna xwe qence, ew kese. ` (Tirmizî, Radâ, 11)

`Jinava we ji zilimkaranre emê ezabekî mezin bidin tam kirin.` (Furqan19)

`Tu hevkar û dostê zaliman nîne.` (Şura 8)

`Kê li hevjîna xwe bide, li roja qiyametê ez neyarê wîme.` (Riyazu Nasihîn)



# Xwepêşandanên gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê didomin

Serhildanên gel yên li Rojhilatê Kurdistan û Îran bê navber dewam dikin, Roj bi roj serhildan firehtir dibin û hejmara welatiyên li ser destê rêjîma Îranê tên qetilikirin, desteserkirin û girtin zêde dibin.

**Navenda Nûçeyan**

Bi qetilkirina keça Kurd Jîna Emînî ya 22 salî, li tevayiya bajarên Rojhilatê Kurdistanê û gelek bajarên Îranê agirê serhildanê vêket û ev serhildan heta roja îro jî bi awayekî berfireh dewam dikin. Rêjîma Îranê jî li hemberî xwepêşandanên gel xwe negire û li dijî xwepêşandanan kuştin, şidet û binçavkirinê dik. Xwepêşandanên li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ku bi daxwaza azadî û jiyanê dest pê kir gihişteiye asteke nû û li her derê Îranê û Rojhilatê Kurdistan belav bûye.

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan û çavkaniyan, ji destpêka xwepêşandanên li Rojhilatê Kurdistan û Îran heta niha zêdetirî 350 kesan hatine qetilkirin, ku ji wan 50 jî zarokin. Sindoqa Alîkariya Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) di rapora xwe ya herî dawî de bang kir ku divê hedefgirtina zarokan bi dawî bibe.

Di 18 Mijdarê de li bajarên Mihabad, Kamyaran û Sine merasîma spartina xakê ya hinek xwepêşanderên di xwepêşandanan de jiyana xwe ji dest dayîn veguherî xwepêşandanek mezin û gelek dirûşmeyên li dijî rêjîmê hatin berzkirin. Herwiha li bajarên Xoy, Urmiye, Pîranşar, Serdeşt, Bokan, Mihabad, Seqîz, Merîwan, Dîwandere, Kamyaran, Sine, Bîcar, Dêwlan, Pawe, Serpêlî Zehaw, Sehne û Îlamê bi pêxistina agir û girtina rê li trafîkê xwepêşandan û çalakî hatin li darxistin. Heman demê de dirûşmeyên 'Jin, Jiyan, Azadî' û 'Mirin ji bo dîktator' hatin berzkirin. Li gelek gundan bi taybet gundên Serdeşt, Sine, Kamyaran û Dêwlan xwepêşandan û çalakî hatin li darxistin.

Li bajarê Sehne bi hezaran kes ji bo tevlîbûna merasîma salvegera koça dawî ya hunermendê navdar yê Yarsaniyan Seîd Xelîl Elî Nejad, kombûn. Lê hêzên ewlekariyê êrişî girseyê kir û ew jî merasîmê vegerand xwepêşandanê. Li gorî çavkaniyan di encama xwepêşandanên 18 Mijdarê de yên li bajarên Bokan, Pîranşar û Mihabadê de herî kêm 4 xwepêşander jiyana xwe ji dest dane. Herwiah li gelek bajarên Sîstan û Belucistanê; Zahîdan, Êranşehîr, Rasik, Xaş,



Peşîn, Çabehar, Aşar û Serawan meş û xwepêşandan hatin li darxistin. Heman demê de li bajarên Tehran, Qezwîn, Tewrêz, Bender Ebas, Şîraz, Îze, Semîrom, Erdebîl, Babol, Xumeyn, Bender Deyir û hinek navçeyên din yên Îranê çalakiyên cuda cuda berdewam bûn.

# NADA: Bi dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' emê bi têkoşîna xwe ve girêdayî bimînin

**Navenda Nûçeyan**

**Hevgirtina Jinan a Demokratîk a Herêmî (NADA) bi boneya nêzîkbûna 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan a Cîhanê, daxuyaniyeke nivîskî da û tê de diyar kir ku ji bo rizgarkirina jinan ew ê têkoşînê mezintir bikin.**

NADA di daxuyaniya xwe de diyar kir pergala kapîtalîst hemû rêbazan bikar tîne da ku îradeya jinan bişkîne û got: "Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan a Cîhanê ya vê salê nêz dibe, lê hîn jî li hemû deverên cîhanê zêdebûneke berbiçav a tundiya li ser jinan heye. Ev yek jî hemwextî bilindbûna asta têkoşînê ji aliyê jinan ve ya li dijî her cure tundiya li ser jinê û binpêkirinên eşkere yên li ser jinan û berfirehbûna qada wê ya erdnîgarî û bandorên wê yên xurt ên li ser civakan tê kirin. Ev tundî asta tirsa pergala kapîtalîst a global û zihniyeta wê ya desthilatdar a baviksalarî ya ji vîna jinên azad nîşan dide. Ji ber vê yekê hemû rê û rêbazan bi kar tînin da ku îradeya jinan bişkîne, wan bêdeng bikin û wan ji maf û azadiyên wan bêpar bihêlin, dighêje asta ku jinan qetil dikin. Ev jî bi taybet teqez dike ku em di serdemekê de ne ku çanda tundiya li ser jinê digihêje asta diyardeya 'qirkirina jinan' bi hemû wateya xwe."

NADA da xuyakirin ku ew wek Hevbendiya NADA piştgiriya xwe ji bo jinên Îranê û şoreşa wan radigihînin û wiha dewam kir: "Bi boneya nêzbûna Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan a Cîhanê, em piştgiriya xwe ji bo kampanyaya 'Ez jiyan im' radighînin ku vê dema dawî ji hêla rêxistin û torên jinan ên pêşeng ên li seranserê Rojhilata Navîn û bakurê Afrîkayê ve hatî destpêkirin."

Hevgirtina Jinan a Demokratîk a Herêmî (NADA ) da zanîn ku ew girêdana xwe ya bi têkoşîna azadiya jinê re û israra xwe ya mezinkirina têkoşîna xwe teqez dikin, heta ku amûra şerê bêserûber raweste, ewlekarî û aramî li herêma me ya kevnar pêk were û wiha got: "Em ê bi dirûşma ku vê dawiyê di şoreşa jinan a Îranê de bal kişandiye û li herêm û cîhanê deng vedaye ku ew jî 'Jin, Jiyan, Azadî' ye, bi têkoşîna xwe ve girêdayî bimînin."

# Peyamên Sersaxiyê ji bo malbatên qurbaniyên teqîna Silêmaniyê re hatin dayîn

**Navenda Nûçeyan**

**Gelêk destgeh, rêxistin û aliyên Kurd bi daxuyaniyan ji malbatên qûrbaniyên teqîna Silêmaniyê re sersaxî xwestin û ji bo birîndaran şefa xwestin.**

Li taxa Kaziwa-2 ya bajarê Silêmanî yê Başûrê Kurdistanê ji ber gaza xwezayî teqînek pêk hat. Di encama teqînê de 15 kesan jiyana xwe ji dest da, 12 kes jî birîndar bûn. Derebarê teqîna Silêmabniyê de, hevserokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK), Meclisa Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD), Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Nûnertiya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li Başûrê Kurdistanê, Konseya Rêveber a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) û Meclisa Giştî ya Kongra Star bi daxuyaniyan sersaxî ji malbatên qurbaniyan re xwestin.

KCK'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku bûyera dil bi êş a li Taxa Kawize-2 a Silêmanî ku ji ber teqîna gaza malê pêk hatî, ji ber vê yekê hejmarek ji mirovan bûne qurbanî, vê yekê ew gelekî êşand. Her wiha birîneke kûr li ser dil û derûniyê li dû xwe hişt û got: "Hêvî û hestê me bi xelkê niştîmanperwer ên Silmanî re heye, bi taybetî êş û xema malbat û kesûkarên ew welatiyên ku di teqînê de bûne qûrbanî û birîndar bûne."



Herwiha PYD`ê sersaxî ji şêniyên Silêmaniyê û malbatên qurbaniyên teqîna li bajar re xwest û diyar kir ku birîna her parçeyekî Kurdistanê birîna Rojavayê Kurdistanê ye jî û got: "Em bi gelê xwe yê Silêmaniyê re ne û sersaxiyê ji hikumeta herêmê û YNK`ê û tevahî malbatên qurbaniyan re dixwazin û hêviya şîfaya lezgîn dixwazin."

TEV-DEM`ê jî ji aliyê xwe ve peyama sersaxiyê ji bo qurbaniyên Silêmaniyê da û got: "Em sersaxiyê ji gelê Kurd re, bi taybet ji şêniyên Silêmaniyê re dixwazin û şîfaya lezgîn ji birîndaran re dixwazin."Nûnertiya Rêveberiya Xweser sersaxî ji malbatên qurbaniyên teqîna li Silêmaniyê re xwest

Nûnertiya Rêveberiya Xweser a li Başûrê Kurdistanê jî bi peyamekê ji malbatên qurbaniyên teqîna li Silêmaniyê re sersaxî û ji birîndaran re şîfaya lezgîn xwest û got: "Em sersaxiyê ji malbatên qurbaniyan re dixwazin û xemîngiya xwe parve dikin, ji giyanê qurbaniyan re dilovanî û ji birîndaran re şîfaya lezgîn dixwazin. ``

Herwiha têkildarî Teqîna li silêmaniyê Kongra Star bi daxuyaniyekê sersaxî da malbatên qurbaniyan û banga girtina tedbîran ji bo parastina zarok û jinan kir û got: "Em ji malbatên qurbaniyan re sersaxiyê û ji birîndaran re şîfayê dixwazin. Em hêvî dikin ku her kes ji karesatên bi vî rengî yên ku sedemên wan teknîk in, dûr be. Em bang li desthilatê û aliyên xizmetguzariyê dikin ku ji bo parastina jin û zarokên li malan tedbîran bigirin. Her wiha bang li hemû malbatan dikin ku tedbîrên silametiyê pêk bînin û bi awayekî rast sîstemên gaze û hwd bi kar bînin."

KNK jî derbarê teqîna li Silêmaniyê bi daxuyaniye sersaxî da malbatên kesên di teqîna li Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê de jiyana xwe ji dest daye û ji birîndaran re şîfa xwest.

# Heqîqeta Rêber Apo

Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat diyar kir ku Rêber Apo mîna ku hesabê kiryarên bi serê hevalên xwe yên keç, xwişkên xwe yên di zarokatiyê de bipirse, berê xwe da azadiya jinê. Her ku ber bi azadiya jinê ve meşiya, jinan jî berê xwe dan Rêber Apo.

Rêber Apo meşeke azadiyê ya bêdawî û bênavber e, rastiya jiyaneke azad û demokratîk e. Rêber Apo bi kesayetiya xwe ya bi eşqa heqîqetê dagirtî, bi azadîpareziya jinê, ekolojîk û demokratîk karakterê PKK'ê afirand û nasnameya wê ava kir. Rastiya PKK'ê berhema herî bêhempa ya Rêber Apo ye ku bêyî xiyanetê li xeyalên xwe yên zarokatiyê bike bênavber ber bi azadiyê ve meşiya. Lewma eger PKK tenê bi bername û rêziknameya xwe, bi armancên xwe yên taktîk û stratejîk ên demkurt, navîn, demdirêj bê pênasekirin, wê gelekî kêm bimîne. Îdeolojî û polîtîka, bername û rêzikname, armanc û plansaziyên stratejîk ên PKK'ê di kesayetiya Rêber Apo de şênber bûye û hêza civakîbûnê bi xwe re aniye. Lewma rastiya Rêber Apo û PKK'ê her cûre zehmetî û astengî ji ber xwe rakir û bi dilxwaziya têkoşînê nirxên mezin afirand, ji mirovahiya azad re bû çavkaniya hêviyê.

**`Rêber Apo da pey xeyalên xwe`**

Zarokatî di emrê mirovan de dema herî sade, pak, azad, wekhev û saf e. Dema zarokatiya Rêber Apo jî tevî van taybetmendiyan hemûyan, pêvajoyeke xweser bû. Rêber Apo zarokekî gelekî taybet bû ku bi aqil û hestên xwe, bi nêzîkatî û têkiliyên xwe, bi cidiyet û daxwazeke mezin da pey xeyalên xwe. Bi baldariya xwe ya li jiyanê, bi pirs, matmayî, hezkirin, coş, kelecan, bi hemû hestên xwe û lêgerîna xwe ya aqilane, di nava sade û kûrbûneke bêhempa de ye. Durust e, parve dike, bi rêxistin dike, diafirîne; dixwîne, fêhm dike, hewl dide jiyanê binase. Lêgerîna wî ya li wate û heqîqetê kûr û balkêş e. Gava ku mirov li dîroka mirovahiyê binihêrin, wê bê dîtin ku pêvajoya civaka xwezayî pêvajoya zarokatiya mirovan e, lewma dişibe dema zarokatiya mirovekî. Eger mirov taybetmendiyên li civaka xwezayî yek bi yek bihijmêre, em ê bibînin heman taybetmendî bi zarokekî re jî heye. Her du rastiyên hebûnê nîşaneya hucreya esasî, rastiya civakê û mirovan e. Mirov ev e, ya jê û pê ve derew e, berevajîkirin e. Rêber Apo hucreya esasî ya civakê û mirov veguherand deryayeke mezin a wateyê. Ew şervanekî rastiyê yê dilxwaz e ku jin a azad, civaka azad ji nû ve afirand.

**`Rêber Apo bi civaka azad civakbûneke nû afirand`**

Ya ku Rêber Apo bi PKK'ê ji nû ve afirand; mirov ê azad, jin a azad, gel ê azad û jiyana azad e. Rêber Apo li hemberî malbata kevneşop, nirxên feodal, çanda zayendîperest, mêtingeriya qirker û modernîteya kapîtalîst bi rengekî ku di dîrokê de kêm caran hatiye dîtin têkoşîneke mezin meşand û bi jin a azad re civakîbûneke nû afirand. Nehişt ku fikir û hestên koletî, jiyana ji cewhera xwe hate dûrxistin û gemarîkirin vê civakîbûna bi kedeke mezin afirandiye gemarî bike, nehişt ku rastiyê binixumîne. Li ber sîstema cîhanê ya kapîtalîst



faşîst û modernîteya wê rabû ku asta herî bilind a serweriya mêr e û têkoşîna heqîqetê bi daxwaz û eşqeke mezin meşand. Hêzên modernîteya kapîtalîst jî bi avakirina sîstema êşkenceyê ya Îmraliyê bersiv dan vê yekê. Sîstema tecrîd û êşkenceyê ya Îmraliyê, şêweyê tolhilanînê ye ku modernîteya kapîtalîst û emperyalîst a faşîst ji Rêber Apo hiltîne. Sîstema modernîteya kapîtalîst a dijminê civakê û jinê, bi sîstema êşkence û tecrîdê ya Îmraliyê tolê ji Rêber Apo hiltîne ku jin a azad, civak a azad afirandiye.

**`Civakbûna Kurdistanê di şexsê Rêber Apo de şînber bû`**

Civakîbûna Kurdistanî ya ku bi şexsê Rêber Apo de şênber bû, bi gihîştina îdeolojiya sosyalîzmê wê PKK biafirîne. Qonaxa koma destpêkê ya beriya avabûna PKK'ê, têkiliyên hevrêtiyê yên wê demê, wê bibe pêvajoyeke ku îdeolojî, jiyan û feraseta têkiliyê ya PKK'ê lê bê avakirin. Nirxên neteweyî demokratîk û sosyalîst ên PKK'ê wê di têkiliyên hevrêtiyê de li ser xeta 'hevaltî' bikeve meriyetê, ev xet wê destpêkê wê xwe bigihîne mirovan, nasnameyên pêşeng biafirîne û piştre jî PKK'ê ava bike, meşa dîrokî gav bi gav biafirîne.

**`PKK`ê şînberiya rihê bilind veguherand rastiyê `**

Ev pêvajoya meyînê di asta dîrokî de girîng e. Ev meşa bi heybet, ku bi hevalên Hakî, Kemal, Hayrî, Mazlûm û Sakîne Cansiz dest pê kir, wê bi têkiliyên hevrêtiyê yên mezin û bi wate rêya xwe bibîne û hêza meşê ava bike. Ruh û saftiya zarokatiyê ya ji dest nehate dayin, wê bi îdeolojiya sosyalîst re bigihêje hev, exlaq, mirov û têkiliya sosyalîst rastiya 'heval' hîn bêhtir bilind bike. Wê hucreyên esasî zêde bike, ber bi şoreşa civakî ya mezin ve bi gavên hîn ji xwe bawer bimeşe. Piştî ku hevrê Hakî 18'ê Gulana 1977'an şehîd bû, ev rewşa avabûnê ya di pêvajoya mayînê de bû, wê bigihêje asteke hîn bilind, berpirsyariya xwegihandina biryardariyê biafirîne. Bersiva li vê têkiliya hevrêtiyê ya gelekî hêja ku mîna ruhê cotik bûn, wê bibe Partîbûn. PKK wê bibe şênberiya vî ruhê bilind û veguherîna rastiyê. Ya ku îro PKK'ê li ser piyan dihêle, tevî ku cîhana kapîtalîst bi ser ve tê jî PKK têk naçe, sedema bingehîn a vê yekê ev têkiliya hevrêtiyê, sekna jiyana azad, mirov ê azad e. Ji ber ku hucreya esasî ya mirovahiyê mîna dargerîngekê PKK pêçandibû, her ku di mirovahiyê de israr dike, ev yek ji Kurdistanê ber bi Rojhilata Navîn û cîhanê belav dibe.

**Rêber Apo berê xwe da azadiyê`**

Rêber Apo mîna ku hesabê kiryarên bi serê hevalên xwe yên keç, xwişkên xwe yên di zarokatiyê de bipirse, berê xwe da azadiya jinê. Her ku ber bi azadiya jinê ve meşiya, jinan jî berê xwe dan Rêber Apo û ji vê derê jî ev karê jinê yê azad ê bêhempa û dîrokî afirî. Ev sekn û têkoşîn bû rabûna li ber serwerên cîhanê yên desthilatdarîperest ên mêr, bû rabûna li ber xwedayên bêmaske û tazî. Ji xwe dest pê kir û mêr kuşt, ji jinên Kurd dest pê kir û rastiya jin a azad zindî kir, asteke nû da sosyalîzmê. Jin kir hêmana bingehîn a jiyan wekhev û azad. PKK êdî meşeke jinê ya azad e, artêşbûna jinê ye, partîbûna jinê ye û rastiya jiyana demokratîk û azad e ku berê xwe daye konfederalîzma jinê ya demokratîk a cîhanê.

**`Konferansa Jinê ya Navnetewêyî silav dikim`**

Konferansa Jinê ya Navneteweyî ya Duyemîn ku 5-6'ê Mijdarê li Berlînê pêk hat, çalakîbûna vê rastiyê ye. Konferansa Jinê ya Navneteweyî ya Duyemîn ku bû qada bi coş û kelecaneke mezin, nîşaneya şênber a wê yekê ye ku sedsala 21'ê bibe sedsala jinê. Di vê konferansê de dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' li ser zimanê jinan bû rastiya jiyana azad a li çar aliyên cîhanê. Konferansê bi yekîtiya têkoşînê ya bi biryardariya jin ên azad, mizgîniya cîhaneke demokratîk û azad da. Bi vê wesîleyê em spasiya komîteya amadekar a konferansê û delegeyên konferansê hemûyan dikin, ji ber ku ev hesta bilind û bêhpa dan me. Hemûyan bi hezkirin û bi rêzdarî silav dikim. Ev konferans ji bo jinên ku di oxira azadiyê de têdikoşin bû çavkaniya sûdwergirtin û hêzê ji hemû jinan re. Ji aliyê têkoşîna jinê ya cîhanê ve pêşengiya îdeolojîk a Tevgera Azadiyê ya Jinên Kurd careke din û bi rengê herî xurt piştrast kiriye. -*ANF*



## Planeke nû ya bi xûn

Farûk SAKIK

13'ê mijdarê li Stenbolê li kolana Taksîmê bombeyek teqiya. Di encamê de 6 kesan jiyana xwe ji dest dan û 81 kes jî birîndar bûn.
Gelek kesên ku dengê vê teqînê bihîstin gotin starta hilbijartinan dest pê kir. Sala 2015'an û hilbijartinên 1'ê Mijdarê hat ber çavên wan.
Di hilbijartinên 7'ê Hezîranê de Kurdan û tifaqa demokrasiyê destûr nedabû ku AKP bi serê xwe hikûmetek ava bike.
Li ser vê yekê, AKP pêvajoya şer û kampanya hilbijartinê bi hev re da.
Her roj li hin deveran bombe diteqiyan.
Komkujiyên wek Pirsûs û Enqerê pêk hatibûn.
Di encama hilbijartinên 1'ê Mijdara 2015'an de, AKP û MHP'ê desthilata xwe ya faşîst îlan kirin.
Em dîsa vegerin Taksîmê qada komkujiyê.
Erdogan demekî dirêj bû kampanya hilbijartinên 2023'yan dabû destpêkirin.
Kîngê da destpêkirin? Di sibata 2021'ê de bi êrişa Garê da destpêkirin. Ji wê rojê ve ku va bû 2 sal serketinek ku ji wê derê bîne tune ye.
Bi sepeta vala vedigere Enqerê. Kîmyasal jî bi kar anîn lê yek fotografek serketinê ku ji civaka xwe re parve bike, tune bû.
Lê wext êdî dereng bû. Ew roja qedera wî, roja hilbijartinan nêz dibûn. Hêviyên wî yên ji wezîrê şer Hulusî Akar êdî nema bûn.
Suleyman Soylu ket dewrê. MHP'ê jî ji bo di tifaqê de bimîne Soylu îşaret dikir. Suleyman Soylu jî êrişa Kobanê, Minbic û Til Rifetê îşaret kirin.
Berî plana Soylu, li Astanayê û li hin navendên cuda ji bo êrişa van herêman bikin, li destûr û îcazetan geriyabûn. Dema destûr negirtin bi du planek nû ketin. Plana nû jî plana Suleyman Soylu bû. Wê li Stenbolê teqînek pêk bihata û wê bikirana hincet da ku êrişên dagirkeriyê bidin destpêkirin.
Suleyman Soylu ji bo plana xwe, ji kontrayê xwe yê Bakurê Kurdistanê Aslan Tatar, Aslan jî serokê MHP'ê yê navçeya Basa M.Emîn Îlhan erkdar kir. Piştre jî hat îspatkirin M. Emîn, ew jina ku navê wê di komkujiyê de derbas dibe, ji Sûriyê derbasî Stenbolê kiriye.
Di kêliyên ku bombe teqiya de Suleyman Soylu li Idlibê bû. Kesî ev pirs nekir; gelo çima Soylu diçe Idlibê?, Idlib axa Sûriyê ye, çima wezîrê karê derve naçe?, Heger mijarek ewlekarî û eskerî be çima, Hulusî Akar naçe? Û gelek pirs din.
Piştî teqînê Soylu di daxuyaniya xwe de digot; Ev kesa ku ev çalakî pêkaniye endama PYD-PKK'ê ye. Li Kobanê perwerdeyeke taybet girtiye. Talîmata çalakiyê ji Kobanê girtiye û di ser Efrînê re derbasî Tirkiyê bûye.
Piştî vê axaftinê û daxuyaniyên ji aliyê YPG, QSD, MSD û PKK'ê ve hatin dayin, derewên Soylu yek bi yek hatin îfşakirin.
Ji bo ku êrişî Kobanê bikin her roj derewek servisî medya dikirin. Lê di demekî kurt de dihat îspatkirin ku ev senaryo ye.
Em ê, ew rastiyên bi serokê MHP'a Basayê M.Emîn Îlhan re eşkre bûn jî deynin aliyek.
Lê dibe ku em behsa ew jina ku bersûc hatî girtin bikin.
Rewşa fizîkî bi serê xwe îspat di kir ku îşkence dîtiye. Hin îfade pê dane qebûlkirin.
Hin îfadeyên ku Kurdan hedef nîşan bidin lê bar kirine. Ji bo Amerîka yê jî bi bîr bixin tîşortek ku li ser navê bajarekî Amerîka nivîsandiye lêkiribûn. Tîşort 2-3 beden jê re mezin bû. Herkesî ev detay dît.
Ev hemû detay îstixbaratên dewletên mezin jî dîtin. Gav bi gav, kêlî bi kêlî agahî di dest wan de hene. Dive ev îstixbarat carek be jî bi wijdanî tevbigerin û wan agahiyan di dest xwe de parvekin.



# Gerîlayên HPG û YJA-Starê: Me di her alî de serkeftin ji xwe re kiriye armanc

Gerîlayên HPG û YJA Starê diyar dikin ku wan di 44'emîn salvegera damezrandina PKK'ê de jî di her warî de serkeftin ji xwe re kirine armanc.

Gerîlayên HPG û YJA-Starê bi boneya 44'emîn salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) axivîn. Gerîlayên Azadiyê, bal kişandin ser girîngiya têkoşîna li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û banga bilindkirina têkoşînê kirin. Gerîlayên Azadiyê her wiha diyar dikin ku PKK ji bo gelên Rojhilata Navîn û hemû gelên bindest têkoşîna mirovatiyê bi rê ve dibe.
Yek ji wan gerîlayan Masîro Şoreş, bal kişand ser tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê rêvebirin kir û banga têkoşîna li dijî tecrîdê kir. Masîro Şoreş ragihand ku têkoşîna wan wê heta dawiyê berdewam bike û derbarê salvegera damezrandina PKK'ê de jî ev nirxandin kir: "Em îsal dikevin 45'emîn sala damezrandina PKK'ê. Berxwedana me bi şerê li Zap, Metîna û Avaşînê ya li hemberî dewleta Tirk a faşîst berdewam dike. Berxwedan, têkoşîn û qehremaniya di vî şerî de ji bo me moralê herî mezin e. Hesta ku herî zêde li gel me ava dibe û tişta herî zede em pê kêfxweş dibin ew e ku me di nava gerîla de cihê xwe girtiye. PKK ji bo têkoşîna gelan ava bûye, bi vî awayî mezin bûye û têkoşîna xwe heta roja me ya îro aniye. PKK ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû mirovatiyê, gelên azadîxwaz û berxwedêr têdikoşe. Ji ber ku PKK temsîliyeta mirovahiye dike. Niha li Hêremên Parastinê yên Medyayê berxwedaneke pir pîroz tê raberkirin. Gerîla tu carî rê nedaye ku dagirkerî derbasî axa me bibe û em rê nadin jî. Em bi moralê ku ji hevaltî, têkoşîn û berxwedana Rêber Apo û gelê xwe digirin, têkoşîna xwe bi rê ve dibin."
Gerîlayê HPG'ê Masîro Şoreş herî dawî bang li ciwanan kir ku tevlî nava refên gerîla bibin û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Ez bang li ciwanan dikim bila erk û berpirsiyariyên xwe pêk bînin. Em ber bi serkeftinê ve diçin. Divê têkoşîn û keda her kesî di vê meşê de hebe. Em bang li ciwanan dikin ku di vê berxwedaniya pîroz de cihê xwe bigirin."

**`Ev sal wê bibe sala azadiyê`**

Gerîlaya YJA-Starê Sîdar Mexmûr jî da zanîn ku wek fedayiyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şikandina tecrîdê dikeve ser milê wan û got: "Di 45'emîn salvegera damezrandina PKK'ê de me di her alî de serkeftin ji xwe re kiriye armanc. Li hemberî dijmin serketin a me ye. PKK bi xwîn û keda şehîdan mezin bûye û heta roja me ya îro hatiye. PKK di 45'emîn salvegera xwe de, ji her demê zêdetir hêz û baweriyê ava dike. Ev sal wê bibe sala azadiya fizîkî ya Rêber Apo û gelê Kurd. Soza me ew e ku em bigihîjin serketinê."
Gerîla Sîdar Mexmûr jî banga tevlîbûna nava refên gerîla kir û wiha pêde çû: "Eger jiyanek a min ji nû ve çêbûba, min ê ew jiyan jî dîsa di nava PKK'ê de jiyan bikira. Ji ber ku PKK cihê jiyana pîroz û



keramet û qehremaniyê ye."

**'PKK ji bo gelên bindest çavkaniya moral û hêviyê ye`**

Gerîlayê HPG'ê Çiyako Gabar jî salvegera damezrandina PKK'ê li gelan pîroz kir û diyar kir: "Wek gerîlayên HPG'ê ji bo ku tecrîd were şikandin, em ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe têkoşîna xwe bilind bikin. 45'emîn salvegera damezrandina PKK'ê, em li Serokatî, li hevalên şehîd û hemû gelên bindest pîroz dikin. PKK hem ji bo me, hem jî ji bo gelê me xwediyê wateyek pir cûda ye. PKK ji roja hatî damezrandin heta roja îro, ji bo hemû gelên bindest bûye çavkaniya moral û hêviyê. PKK wek partiyeke mezin ji bo hemû Rojhilata Navîn peşengiya têkoşîn û azadiyê dike."

**`Berxwedana Kemal, Xeyrî û Sarayan îro li çiyayên Kurdistanê tê raberkirin`**

Gerîlaya YJA Starê Viyan Avesta jî dibêje ku çavkaniya hêz û moralê Rêber Apo ye û wiha axivî: "Her wiha hêza ku em digirin, hêza hevalên ku îro di çeperan de li ber xwe didin, hevalên ku di zindanan de têdikoşin e. Em li ser bîr û baweriya Serokatî dimeşin. Di sersala damezirandina Partiya me de têkoşîn gihîştiye asta lûtkeyê. Partiya me bi Kemal, Xeyrî û Sarayan ve dest pê kir. Roja me ya îro şopa berxwedana wan hevalan li çiyayên Kurdistanê tê meşandin. Kemal Pîr bû Baz Mordem, Sara bû şehîd Helbest Koçerîn. Bila dijmin vê yeke ji bîr neke; berxwedana ku em didin meşandin ti carî bin nakeve. Ji ber ku em bi bîr û baweri û îradeya xwe dimeşin. Em bi felsefeya Rêber Apo dimeşin. Di çeperên Zap, Avaşîn û Metîna de berxwedanek di asta herî jor de heye. Her çiqasê çekên kimyewî li ser me were bikar anîn jî, lê li hemberî wan em ti carî paşve gav navêjin. Bila dijmin vê yekê baş bizanibe." *ANF*

# Çalakvanên Qeladizê xwestin qada hewayî ya herêmê ji Tirkiyeyê re were girtin


***Welatiyên bajaroka Qeladizê ya ser bi îdareya Raperînê daxwaz kirin ku li dijî êrişên hewayî yên dewleta Tirk û Îranê yên li ser Herêma Kurdistanê biryara herêma 'dijî firînê' pêk were û pêşî li êrişên hewayî werin girtin.***

Êrişên dewleta Tirk a dagirker û Komera Îslamî ya Îranê yên li ser Herêma Kurdistanê berdewam dikin. Ev herdu welat herî zêde bi riya qada hewayî êrişan pêk tîne.
Welatiyên bajaroka Qeladizê ya ser bi îdareya Raperînê daxwaz kirin ku li dijî êrişên hewayî yên dewleta Tirk û Îranê yên li ser Herêma Kurdistanê biryara herêma 'dijî firînê' pêk were.
Çalakvanê medenî Qadir Ehmed ê ji Qeladizê diyar kir ku êrişên hewayî yên dewleta Tirk ên bi riya balafirên şer û balafirên bêmirov ziyanek mezin daye Herêma Kurdistanê û got: "Li kûrahiya Herêma Kurdistanê welatiyan hedef digire. Niha êrişên balafirên Îranê jî li ser ve hatine zêdekirin. Di nava welatiyan de tirs çêkiriye. Ji bo pêşîlêgirtina êrişan, divê biryara herêma dijî firînê pêkwere. Êdî rê neyê dayîn qada hewayî ya Herêma Kurdistanê were derbaskirin û êdî êrişên hewayî li ser welatiyan û xaka Herêma Kurdistanê pêk neyê."
Çalakvanê ji Qeladizê Elî Qadir destnîşan kir ku Tirkiye ji bêdengiya civaka navneteweyî derfetan dibîne û lewma çekên kîmyawî li Herêma Kurdistanê bikar tîne û biriya balafirên bêmirov li ser xak û welatiyên Herêma Kurdistanê êrişan dike.





Elî Qadir destnîşan kir ku niha dewleta Tirk a dagirker li dijî gerîlayên azadiyê çekên kîmyawî li ber çavê cîhanê bi kar tîne û cîhan jî bêdenge got: "Ji ber berjewendiyên wan li gel Tirkiyeyê hene li hemberê vê binpêkirinê bêdeng in. Berdewambûna tevgera hewayî ya li ser heremê tirs xistiye di nava welatiyan de. Welatî êdî nikarin bi azad geştê bkin. Timî tirsa wan heye ku balafir wan hedef bigire. Em daxwazê dikin ku biryara herêma dijî firînê pêk were. Rê neyê dayîn bi ti awayî dagirker êrişên hewayî li ser xaka Başûrê Kurdistanê pêk bînin."
Komîsyona Ewlekariyê ya Navnetewî bi armanca parastina welatiyên Herêma Kurdistanê ya ji êrişên esmanî, di sala 1991'an de biryara dijî fîrînê derxist, lê heya niha jî ev biryar weke pêwîst neketiye meriyetê. 31 sal bi ser biryarê re derbazbûne, lê niha asîmanê Herêma Kurdistanê bi balafir û dronên dewleta û Îranê tije bûye. Beramberî binpêkirinên dewleta Tirk jî civaka navnetewî bêdengiya xwe diparêze. - ***ROJNEWS***



## Armancên teqîna Stenbolê

Ahmet AKTAŞ

Jixwe ji roja ewil ve, diyar dibû ku ev bûyer weke senaryoya dewleta tirka ye. Nuha zelaltir dibe ku, Suleyman Soylu, Erdogan û rayedarên dewletê, çi gotinên li ser vê bûyerê gotin e, hemû nakok û derew derketin û wan ev teqînê amade kirine.
Armancên wan jî, aşkere xwuya dibe ku; bi vê bûyerê re, zemînê xweştir bikin û demek zûtir êrîşê bibin ser Kobanê û HDPê.
Jixwe hîn di saetên despêka teqînê de, li gel daxwuyaniyên Receb û Suleyman, hemû çapemeniya wan, bi yek zimanî gotin, "ev keça teqînî pêkaniye, ji Kobanê ferman standiye, di Efrînê re derbasî Tirkiyeyê bûye û ev kar pêkaniye" û hwd.
Bi vî awayî armancên xwe yekser nîşan dan û roja piştî êrîşê; di axaftinên koma xwe yên roja sêşemê de Bahçeli, bi dengê bilind HDP tawanbar kir û ji bo girtina wê fermana xwe ragihand!
Bêgûman, bi vê armanca taybetî re, armanca bingehin; di kesayateya Kobanê û HDPê de, derbeyê li Şoreşa Rojava û bi giştî li Tevgêra Azadiya Kurdistanê bidin.
Li himber vê siyaset û kiryarên faşîzan ên dîktadoriya R.Erdogan û Bahçelî, rêveberên HDPê, KCKê, PYDê, HSDê û hwd.peyamên xwe yên ku ji vê bûyerê bêrî ne, aşkere û zelal nîşan dan û gotinên wan hemû derew derxistin.
Bi vê teqînê re, hinek mînakên wisa qirêj û qirker yên wan tên bîra mirovan:
1-Zemanekî, serokê MITê H.Fidan gotibû,"xema nexwûn, ji bo em êrîşî Rojava bikin, sedem hêsan e; em ê derbasî binxetê bibin û çend topan bavêjin serxetê û weselam"!
2-Di roja Newroza îsal de li Gevera Colemergê, di maşîna(otomobila) polisekî de 52.5 kg teqemenî hatibû dîtin. Vî polisî, di wê demê de fermî li Stenbolê kar dikir. Nuha li ser çi kariye nayê zanîn. Rewşa vî polisî û vê bûyerê, li Parlemenê ji Soylu gelek pirs hatiye kirin, lê bersîvên zelal nehatiye standin. Belê weke ku li xwe mikûr were gotiye, "armanca qonaxa vê teqemeniyê Stanbol bû"! Gelo nabe ku ev teqîn jî, parçeyek ji vê teqemeniyê be?
Mînakek din a balkêş jî ev e; di çapemeniyê de derket ku vê "keça terorista Soylu-Receb-Bahçeli", du caran li gel berpirsiyarê MHPa bajarokê Şernexê axivî ye!
Divê neyê jibîr kirin, di kesayetiya KOBANÊ de, ew kul û derdê giran ê serketina Şoreşa Rojava, di dilê R.Erdogan(Kobanê hema ket an dikeve) û hevalbendên wî de maye û şax vedaye. Lewma hema ji fermandarê xwe yê jor rohniya kesk bibîne, ne "şevekê ji nişka ve", belê li şev û rojê na pirse, heme bi lez êrîşî Kobanê û Rojava dike.
Ji bo ku destûrê bistîne, hemû hebûna Tirkiyeyê pêşkêşî DYE û Rûsyayê dike.
Di heman roja teqîna Stenbolê de, bi malovaniya Serokê MITê ve, Serokê CIA û SVR(istixbarata Rûs) civiyan. Her wiha S.Soylu jî li herêmên Helebê, Efrînê û Idlibê, rêûresmên damezrandina xwendegehan û xaniyan pêktanî!
Ev hevdîtin û karên hatine kirin ne ji xêrê re ne. Her çendîn eşkere nebû bin jî, bêhne genî ji van hevdîtin û hewldanan tê. Lewma hişyarî û amadekariya xurt divê.